AMNESTY INTERNATIONAL
(Sazîya Lêborînê ya Navneteweyî)
DAXUYANÎYA ÇAPEMENÎYÊ

Hemî Îndeks: MDE 24/009/2005 (Gelêrî)
Hejmara Xizmeta Nûçeyan: 045
10 Adar 2005

Belavkirin: **10 Adar 2005 00:01**

Sûrîye: Dawî li binpêkirinên mafên mirovan li dijî Kurdên Sûrîyê bîne

Amnesty International di raporeke ku îro, di erefa salvegera pevketinên Qamişlo de hat weşandin de got ku divê hikûmeta Sûrîyê tavilê dawî li binpêkirinên mafên mirovan li dijî Kurdên Sûrîyê bîne. Divê rayedarên dewletê lêkolînan bidin destpêkirin bo îddiayên kuştinên bê darizandin, mirinên ji îşkence û muameleya xerab a girtîyan û îşkencekirina Kurdan ku ji Adara 2004an û vir de diyar bûne.

Rapora bi navê *'Kurd li Komara Ereb a Surîyê Salek piştî bûyerên Adara 2004an'* binpêkirinên mafên mirovan li dijî Kurdan ên piştî maçeke fûtbolê ya di navbera tîmên Kurd û Ereban de li Qamişlokê li bakurê rojhilatê Sûrîyê lêkolîn dike, ku bûbûn sedema xwepêşan û serhildanan li seranserî welêt û bêtir ji 30 Kurdan hatibûn kuştin. Bêtir ji 2000 mirovan hatin girtin, ku hema hema hemî Kurd bûn. Li gora ragihandinan, girtîyên Kurd ku zarokên heta 12 salî piçûk, jin, keçên xama û kal û pîr jî di nav de bûn, hatin îşkencekirin û muameleya xerab dîtin. Bi dehan xwendekarên Kurd ji zanîngeh û beşên navxweyî yên zanîngehan hatin derxistin, li gora ragihandinan ji ber ku tev li protestoyên aşitîxwaz bûne.

Ji Adara 2004an û vir ve, ragihandinên mirinên Kurdan ên ji ber îşkence û xerabkarîya di bin çavan de zêde bûne: di heft mehên piştî Adara 2004an de pênc ji neh mirinên ku bo Amnesty International hatin raporkirin Kurdên Sûrîyê bûn. Her weha hejmarek mirinên Kurdên li eskerîyê yên di reşwên gumanbar de jî di heman demê de qewimîne: qet nebe şeş mirin, li gora ragihandinan ji ber lêdan û gulekirinên fermandar an hogirên leşkerî. Li gora ku tê zanîn ji bo tu mirinên di herdu kategorîyan de jî qet lêpirsîn nehatine kirin.

Rapora ku encama lêkolînekê ye ku gelek mehan ajotiye, her weha cûdagirtina sîstematîk a bi esasê nasnameyî ku Kurd jê dikişînin rave dike. Bang li Sûrîyê dike ku qedexeyên li ser bikaranîn û bicîhanîna ziman û çanda Kurdan bidawî bîne. Rapor balê dikişîne ser hin rewşan ku parêzvanên mafên mirovan ên Kurd, ku hewl dane ku mafên civaka Kurd li Sûrîyê pêşde bixin û hatine girtin, îşkencekirin û ne adilane hatine darizandin.

Amnesty International weha got, "Divê rayedarên Sûrîyê ji bo bersîva bêmêzîn a hêzên ewlekarîyê bo bûyerên Adara 2004an lêpirsînekê pêk bîne. Divê ragihandinên kuştinên bê darizandin û mirinên ji ber îşkence û muameleya xerab a girtîyan û ragihandinên belav ên îşkencê lêkolîn bikin, û ji bo mijûlbîna bi cûdagirtina sîstematîk li dijî Kurdan li gel binpêkirinên din ên mafên mirovan ku bûne beşeke sedema esebîyet û peqîna tundkarîyê, çareserîyan pêşniyar bikin."

Piştgeh:
1.5 milyon Kurdên Sûrîyê ku piştî Ereban koma etnîkî ya herî mezin a welêt in, ji cûdagirtinên nasnameyî dikişînin ku sînorkirinên bikaranîna ziman û çandê jî di nav de ne. Rapor bang li rayedarên Sûrîyê dike ku qedexeyên bikaranîna zimanê Kurdî li perwerde, kargeh, sazîyên fermî û pîrozbahîyên taybetî rake, û bihêle ku zarok bi navên Kurdî bên qeydkirin û karsazî navên Kurdî li xwe bikin.

Bi sed hezaran Kurdên Sûrîyê di fîilîyatê de bêdewlet in û ji ber wê,xizmetên perwerda giştî, karkirin, tendurustî ji wan

re nayên dayin, û her weha ji mafê hemwelatîbûn û hebûna pasaportekê jî tên bêparkirin. Amnesty International bang li rayedarên Sûrîyê dike ku qanûnsazîyê biguherînin ku çareserîyeke bilez bo bêdewletbûna Kurdên ku li Sûrîyê hatine dinyê bibînin û cûdagirtina li dijî wan a ku bi vê re dimeşe, ji holê rakin.

Dokumenta Gelêrî

****

Ji bo bêtir agahîyê ji kerema xwe telefon bikin bo ofîsa çapemenîyê ya Amnesty International li London, KY, hejmar: +44 20 7413 5566

Amnesty International, 1 Easton St., London WC1X 0DW. web: http://www.amnesty.org

Ji bo nûçeyên mafên mirovan ên herî nuh: http://news.amnesty.org

Ev ne wergereke fermî ya Amnesty International e. *Kopîyeke dokumenta orîcînal: Sûrîye: Kurd li Komara Ereb ya Sûrîyê Salek Piştî Bûyerên Adara 2004an* (hejmara îndeksê: MDE 24/002/2005) li vir peyde dibe: http://www.amnesty.org